EKOVARA NÛÇEYAN YA HEFTANE

08
HEJMAR

BOTAN TIMES

*Nûçeyên kurdî standardên navneteweyî...*

# LI AMEDÊ 8Ê ADARÊ

**“Di vê listika xwe de me dîsa pişta xwe da çanda Kurdî”**

Beril Caymaz

**“Dema em dighêjin girtîgehê hema kincên xwe ji xwe dike”**

Gulistan Korban

**Çawa ku di çar salên dawî de her roj gotiye “Edalet” ew ê dîsa...**

Beril Caymaz



BOTAN TIMES
*Nûçeyên kurdî standardên navneteweyî...*
**EKOVARA NÛÇEYAN YA HEFTANE**
06 ADAR - 05 ADAR 2023 • JIMAR 8 • SAL 1

Xwedî
**BOTAN INTERNATIONAL**

Edîtor/Nûçegihan
**Gulistan Korban Rençber**
**Berîl Caymaz**

Edîtor
**Murat Bayram**

Wergêr
**Yonca Sarsilmaz**

Rûpelsazî
**Ridwan Xelîl**

Bergsazî
**GrafîKURD**

www.botantimes.com

**BOTAN INTERNATIONAL**
**MEDYA LTD. ŞTI**

Xwedî
**Murat Bayram**

Midûr
**Yonca Sarsilmaz**

Pispora Pêşdebirina Çavkanîyan
**Kubra Sagir**

Şêwirmendê Weşanê
**Omer Faruk Baran**

www.botaninternational.com

EUROPEAN ENDOWMENT FOR DEMOCRACY

Fona Ewropayê ya Demokrasîyê piştgirîya Botan Internationalê dike.
Hemî berpirsiyarîya naveroka Botan Timesê
li ser Şirketa Botan International Medya Limitedê ye.

# BOTAN TIMES

**BULTENA HAFTANÊ YA NÛÇEYAN**











## NAVEROK


“Doktorên me hatin herêma erdhêjê lê dîtin ku nexweşxane nînin” ....... 4

“Dema Kurdî diaxivîyan xwe bêhtir ewle hîs dikirin” ....... 5

“Di vê listika xwe de me dîsa pişta xwe da çanda Kurdî” ....... 7

“Dema em dighêjin girtîgehê hema kincên xwe ji xwe dike” ....... 9

Çawa ku di çar salên dawî de her roj gotiye “Edalet” ew ê dîsa ....... 11

Bi 5 pirsan li Îranê jehrkirina xwendekarên keç ....... 13

Wêne-Nûçe: Li Amedê 8ê Adarê... ....... 14

Li herêma erdhêjê jin: Dema serê xwe dişom cilên xwe yên binî dernaxim ....... 17

Îro 8ê Adarê ye – ‘Gulîstan Doku li kû ye?’ ....... 18

“Bila heta serê sibehê bêje tune ye, ma tune dibe?” ....... 19

Fexrîya Adsay: Heta ku em ji çarçoveyeke neteweperwer bêpar bin... ....... 20

“Navên qewî dê li Le Monde diplomatique kurdî bin” ....... 24

Amedspor ê serî li UEFAyê bide ....... 26

Amedspor di rojeva siyasetê de ye, kê çi got? ....... 30

# “Doktorên me hatin herêma erdhêjê lê dîtin ku nexweşxane nînin”

Gulistan Korban Adar 12, 2023




**Bijîşkên li Amedê ji bo 4 hempîşeyên xwe yên di erdhêjê de jîyana xwe ji dest dayîn qurnefîl danîn ber xirbeyên avahiya Galerîayayê.**

Erdhêjên 6ê Sibatê ku bandor li 10 bajaran kir li qada tendûrûstîyê jî tesîreke mezin kir.

Li gor daneyên Wezareta Tendûrûstîyê 448 xebatkarên tendûrûstîyê di erdhêjê de jiyana xwe ji dest dane.

Yekitîya Tabîbên Tirk (TTB) jî dîyar dike ku ji wan 101 jê bişîk in.

Endamên TTB yê yên Odeya Amedê jî ji bo bîranîna 4 hevalên xwe li ber avahiya Galeriyayê bûn.

Seroka Konseya Navendî ya Yekîtiya Tabîbên Tirk Şebnem Korur Fîncanci jî bo pîştgiriya hempîşeyên xwe li Amedê bû.


Doktor Şerîf Demîr dîyar dike ku di avahiya Galerîyayê de 89an can daye. Ji wan 2 jê bîjîş 2 jê jî xebatkarên tendûrûstîyê bûn.

Şebnem Korur Fîncanci jî di mijara erdhêjê de balkişand ser îxmalîya rayedaran.

Ew dibêjê,”Pîştî erdhêjê ji 4 aliyên Tirkiyeyê hevalên me bo alîkariyê hatin bajarên erdhêjê. Lê dîtin nexweşxane tune ye ku ew lê kar bikin.”







# “Dema Kurdî diaxivîyan xwe bêhtir ewle hîs dikirin”

Qesîm Etmanekî Adar 12, 2023




*Wêne: Xwendekarê beşa rojnamegerîyê Eyûp Ok*

Piştî erdhêj li Mereşê çêbûn, bi hezaran mirovên sivîl ber bi bajarên erdhêjê ve çûn.

Ev mirovên ku ji roja yekêm ve di nav prosesa rizgarkirinê de cih digirin, bi her awayî piştgirîya xwe ji bo mexdûrên erdhêjê nîşan didin.

Rizgarkirina kesên di bin kavilan de mayî, belavkirina kelûpelên xwarinê, cil, çêkirina konan û hwd beşeke sereke yê karê van mirovan e.

**Rola Xwendekarên Zanîngehan**

Bêguman di vê prosesê de rola xwendakarên zanîngehan hêjayî behskirinê ye.

Ji roja yekêm ve piranîya xwendekarên zanîngehan bi awayekî rêxistinî di nav vê pêvajoyê de cih digirin.

Xwendekar bi rêya partî, saziyên mirovî û rêxistinên xwendekaran re diçin herêmên erdhêjê.




*Wêne: Eyûp Ok*

Ew çawa beşdarê alîkarîyê bûn, wan çi cure alîkarî pêşkeşî mexdûrên erdhêjê kirin, em ji bo wan pirsan bi xwendakara Zanîngeha Stenbolê Fatê Polat re axivîn.

Fatê Polat ji bajarê Çewligê ye, li Zanîngeha Stenbolê/Cerrahpaşa Teknîkên Labaratuwariya Medikalî dixwîne. Ew dema erdhêj pêk hatiye li bajarê xwe, bi malbata xwe re bûye. Piştî erdhêjê ji ber hîn karen xwe berê xwe daye Stenbolê û piştre bi hevalên xwe yên zanîngehê re çûye herêmên erdehejê.

Polat bi me dide zanîn ku ew û hevalên xwe bi rêya kordînasyona Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) re, çûn bajarê Semsûrê. Ew li wir 9 roj xebitîne.

### Xebatên li bajarê konan

Cara ewil em çûne şaxa Komelaya Çanda Elewîyan a Semsûrê. Ji ber ku navenda kordînasyona HDPyê li wir bû. Koma me ya ku ji Stenbolê hatibû ji 18 kesan pêk dihat. Piştre ji ber pêwistîyê, 6 kesan ji me şandin bajarên konan. Me li wir, roja yekem bi hevalên zana re karê îzolsayona konan kir. Rojên din jî dîsa me ji bo dirûstkirina konan kar dikir; ji bo elektrîkê bibin nav konan me rê çêkir, her wiha min û hevalekî xwe nexşe rêya (krokî) qabloyên elektrîkê amade kir, da ku yên dû me dema werin pirsgirêk nekşînin.

*Fatê Polat*

Rojên din me ji bo cilên qirêj çar makîneyên cil şûştinê anî li bajarê konan; her wiha bo wan makîneyan koneke amade kir û bi awayekî kordîne li wir bikar anî. Êvaran jî me bi dor nobet digirt li ber konan.

Sibehan me bi malbatên erdhejzedeyan re taştê amade dikir, hin hevalên me bi karên paqijiya der û dora konan re eleqeder dibûn, hin ên din bi malbata re diketin têkilîyê û derbarê kêmasîyên wan de, bi wan re dibûn alîkar. Her wiha hevalên mamoste bi zarokan re leyîstokan dileyîstin, çadiran boyax dikirin û pirtûk dixwendin.




*Wêne: Fatê Polat*

### Dayîka ji Kobanîyê û Mihemed û Omer

Yekem car dema ku me konan ziyaret kir, ji bo ku em him malbatan ji nêz ve nas bikin him jî ger hebe pêwisteyekê wan çareser bikin me dayikekê ji Kobanîyê nas kir. Wê Tirkî nizanibû û bi me re Kurmancî kete têkîlîyê. Ji ber ku ez Kurdekê Kirmanc im, min zêde jê fêm nedikir lê hevalê min ê Wanî bi wê re têkîleyeke baş danî. Pêşî piçekî xwe ji me dûr dikir, şermoke jî bû; lê bere berê dayîkê dît ku em Kurd in bi rihetî bi me re têkilî danî, pêwistiyên xwe û yên malbata xwe ji me re digot.

Du heb zarokên wê yên piçûk hebûn; Mihemed û Omer. Em bi wan re Kurmancî axivîn, wan bi Tirkî jî dizanibû lê xwe bi Kurdî baştir îfade dikirin. Dema ew, li wê bajarê konan bi Kurdî diaxivîyan xwe bêhtir ewle û baştir hîs dikirin. Heta em li wir bûn bi me re xwarin dixwarin, diaxiviyan û dileyîstin.

Dixwazim vê jî bibêjim, piştî çar roj li ser hevdu nasîna min û wê malbata ji Kobanîyê, dayê xwest ku gerdena hevala xwe ya ku çar sal berê dabûyê wê bide min. Helbet vê xwesteka wê dile min gelekî şa kir...

# “Di vê listika xwe de me dîsa pişta xwe da çanda Kurdî”

Beril Caymaz Adar 10, 2023



Lîstika me ya yekem li Mêrdînê û navçeyên wê rastî eleqeyeke mezin hat û vê yekê kir ku em dest bi xebatên lîstika nû bikin

Şaneşîn Performans bi lîstika xwe ya nû dê derkeve pêşberî şanohezan.

Navê şanoya nû “Penceşêr” e û wê di 18ê Adarê de li Mêrdînê derkeve ser dikê.

**Yek jî Lîstikvanên Şaneşîn Performansê, Şêrko Janzêm ji Botan Times re behsa lîstika ‘Penceşêr’ kir.**

Lîstika me ya nû yanî Penceşêr, ji lîstika Rojbûna Jokoyî ya Roland Toporê îlhama xwe girtiye. Penceşêr listîkeke performatîf e. Behsa têkilîyên kolonyal û dijkolonyal dike. Em bi vê yekê dixwazin ku temaşevanên me bila bikulin û xwe biêşînin. Lê li ber vê re jî bikenin û em jî ji wan re stranan bêjin.

Texta wê lîstikê ji hêla hevalên me yên Diramaturg, Recep Îçen û M. Xalid Ertoşî ve li gorî çanda Kurdî hatiye amade kirin.

**“Me tenê nehêlin”**

Me di vê listika xwe de jî dîsa pişta xwe da çanda gelêrî ya Kurdî. Di lîstika me de sê listikên ku berê di nav civaka Kurd de dihatin lîstin hene û li gel wan stranên gelêrî jî hene.

Em bi vê yekê hewl didin ku keresteyên edebîyata gelêrî derxînin ser dîke û dîsa pêşkêşî gel bikin. Bi qasî ku em karibin wan ji wendabûnê xelas bikin.

**Dixwazim bi rêya we bang li şanohezên li Mêrdînê bikim di 18ê Adarê de me tenê nehêlin.**

Şaneşîn Performans di sala 2022an de li Mêrdinê ji hêla hin mamosteyên Kurdî û dildarên qada çand û ziman hatiye damezrandin. Di demeke kurt de me lîstika xwe ya yekem a bi navê “Bêcir” derxist. Lîstika li Mêrdinê û navçeyên wê rastî eleqeyeke mezin hat û vê yekê kir ku em dest bi xebatên lîstika nû bikin.



Nivîskar: **Roland TOPOR**

Rejî: **Recep ÎÇEN**

Lêanîn û şanoname:
**M. Xalit Ertoşî/ Recep Îçen**

Dramatûrg: **Sîya Savaş**

makyaj: Rênas Nas

Anîmasyon û Grafîk: **Şoreş Demîrcan**

Cil û Berg: **Şêrko Janzêm**

Dekor: **Erdal Açıl**

Teknîk: **Ozgur Sînan Elîk**

Şêwirmendê Hunerê: **Yaşar Denîz**

Afiş: **Şoreş Demîrcan**


Berpirsiyarê Sehnê: **E. Pîroz Şêr**

Lîstikvan: **Abbas BAYHAN, Erdal AÇIL, E. Pîroz ŞÊR, M. Xalit ERTOŞÎ, Rênas NAS, Sakîne SALVACI, Serdar ZÎV, Şêrko JANZÊM, Şirîn SAXLAM**

**Şaneşîn Performans alikarîyê ji temaşevan û dilxwazên şanoya kurdî dixwaze.**



*Şanolîz Şêrko Janzêm*



# “Dema em dighêjin girtîgehê hema kincên xwe ji xwe dike”

Gulistan Korban Adar 09, 2023



> “Dema em diçin ber girtîgehê hema rast e rast cilên xwe jixwe dike û ji bo lêgerîna laşî destên xwe bi herdu aliyan ve vedike. Wexta ku dighêje ber cîhaza X-rayê jî dest bi derxistina pêlavên xwe dike.”
>
> *Beritan Elyakut*

Roger Baz 3 salî ye û zarokê du rojnamegeran ne.


Bi çûn û hatina hevdîtina bavê xwe hemû rêgezên girtîgehê bi vî awayî ezber kiriye.

Bavê wî Mazlum Geçîkenî heta 8ê Hezîrana 2022yan li Amedê di produksiyoneke de kare kameramaniyê dikir.

Bi operasyona 8ê Hezîranê bi tevî 15 hempîşeyên xwe ew jî hate girtin.

Dayika Roger, rojnameger Berîtan Elyakut pîştî girtina hevserê xwe gelek bi hêrs e.

Ew dîyar dike ku çûn û hatina girtîgehê di kurê wê de dibe sedema travmayan.



> Destpêkê pir li bavê xwe digeriya, pir dipirsî. Em jê re dibêjin bavê te dixebite nekare were malê.
>
> Lê rojeke ku em ji hevdîtina girtîgehê derdiketin destê bavê xwe girt û xwest ew jî bi me re vegere. Piştî ku bavê wî nehat li hember wî bi hers e û nace cem. Her çend me difikrî ku demkiye, lê di rastiya xwe de ew wekî travmayek di hişê zarokî de bi cîh bûye.
>
> *Beritan Elyakut*

Rojnameger Geçîken 9 meh in girtîye.

Bi 'Endamtiya rêxistinê' tê sucdar kirin.

Li gel derbasbûna 9 heyvan jî hê îdanameya ku pê tê suçdarkirin amade nîne.

> 9 meh in ez û hevserê xwe ji hev dur in. Pêvajoyeke gelek dijwar e. Evkas jî ne dîyar e. Him wekî dayikek û him jî wekî jinek mirov gelek diweste. Lê ji aliyê din ve jî van girtinan wekî rojnamegerek me ferî sebrê û tekoşînê dike.
>
> *Beritan Elyakut*

Tirkiye di warê girtina rojnamegeran de di cîhanê de jî di rêzeke gelek xirab de ye.



*Roger baz, Mazlum Geçiken, Beritan Elyakut*

Rojnamegerên ku hêviya wan ji darazê nemaye îro li ber edliyaya Amedê hatin gel hev.

Wêneyên rojnamegerên girtî rakirin û daxwaza azadiya hevalên xwe kirin.




*Daxuyaniya rojnamegeran ya li ber Edliyeya Amedê*

# Çawa ku di çar salên dawî de her roj gotiye "Edalet" ew ê dîsa...

Beril Caymaz  Adar 09, 2023




Di sibeheke sar a payîzê de li deşta Sirûcê li taxeke kevn li benda Ferît Şenyaşarî me.

Em hev dibînin û ber bi mala wan ve diçin. Ev avahî heta çar salên berê apartmana malbata Şenyaşaran bû. Dayika Emîne niha bi kurê xwe yê biçûk Mehmet re li vir dijîn. Li zîlê dixim. Piştî sê dengên çikînê, derîyê hesinî vedibe û Emîne Şenyaşar xuya dike.

Tûtîyê xoşebere bi dengê xwe salonê dihejîne.

Her çiqas serê sibê be jî Ferît Şenyaşar dixwaze bi lez û bez ji malê derkeve.

> Anê, ger tu hazir î, em herin. Dozger di saet heşt û nîvan de tê dadgehê.
>
> Ferît Şenyaşar

Dayik piştî nimêjê ji kurê xwe Ferît re dîbêje ku divê ew pêşî melhemê li çavên wê yên dieşê û lêvê wê yên verimî bide.

Dayika Emîne ji dema dest bi nobeda edeletê kiriye û heta niha gelek pirsgirêkên tenduristiyê re rû bi rû maye.

> Çavên min nemaye, ez bi zehmetî dibînim. Bila kurê min ji girtîgehê derkeve wê çaxê ezê ji çav û cogên xwe emelîyat bibim.

Em ji Sirûcê ber bi Edlîyeya Rihayê ve diçin. Dayîka Emîne li qoltuxê paş bi çavên xwe yên nivvekirî derve temaşe dikir.

Ferît got, ew her sibe di saetên kar de ji malê derdikevin û ber bi êvarê ve jî vedigerin mala xwe.

> Ger rojekê mamoste ji kurê min ê diçê dibistana seretayî re bipirse ka 'Bavê te çi karî dike?' ez meraq dikim dê kurê min çi bersiv bide.

(Ferît dibêje û dibeşişe...)

"Em her sibehê Sûreya Yasînê guhdarî dikin"

Di nîvê rê de Ferît dibêje ku, "Em her sibehê sûreya Yasînê guhdarî dikin û diçin nobetê" û pê re destê xwe dirêjê radyoyê dike. Rê li ber me dirêj dibe.

Em li dora heşt û nîvan li ber edlîyeyê disekinin. Ferît tabûreya dayika xwe datîne li ber barîkatên betonî, paşê jî pankarta bi nivîsa 'edalet' daliqand. Li ber pankartê disekine û bang dike "Maf, Hiqûq, Edalet.."

Min bala xwe da ku erebeya Serdozgerîyê dema derbas dibe bang kirin. Piştre rûniştin û bêdeng li benda edaletê man.

Dayik û kurê wê li vir jî li edaletê digerin

Şenyaşar û kurê xwe bi parêzerên xwe Gokhan Dayik û Hîdayet Enmek re hevdîtineka kurt pêk tînin.

Dû re dema taştê-xwarinê hat. Em ji bo şorbeyekê vexwin diçin xweringeha baroyê. Wan şorbe di saet 12an de vedixwarin. Ji sibêhê ve yekem xwerina bû ku ji qirîka wan derbas dibû.

Em vedigerin ber edlîyeyê. Bandora germa nîvro li Rihayê zêde ye. Ew qartonên xwe yên ku li ser wan diruniştin danîn bin siya darekê. Dayîk û kurê wê li vir jî li edaletê digerin.

Welatîyên ku ji bo serdana dayîkê tên, bi gotinên xwe dilê dayikê germ dikin. Dayîka Emîne çiroka xwe ji wan re digot û digiriya.

> Kurê min li girtîgehê ye. Mêre min û zarokên min hatin qetilkirin.

Îro 604emîn roja nobetê ye. Ferît danê êvarê dema hevl dide ku pankarta bi nivîsa "edalet"ê hilbide, çend polîs tên cem wî. Polîsan ji Ferît re gotin:

> Ji vir biçin, careke din pankartê li vir ve nekin.

Ferît bi aramî guh dide polîsan û pankartê dipêçe.

Dema em diçin malê li Sirûcê di ber avahîyeke reş re derbas dibin. Dayîka Emîne bi tiliya xwe vê avahîyê nîşan dide û dibêje:

> Binêre li vir mêre min û zarokên min hatin kuştin.

Ew avahî Nexweşxaneya Dewletê ya Sirûcê bû.

Wêneyeke li ber dîwarê betonî hatiye kişandin

Saet derdora pencan em dikevin avahîyekê nû hatiye çêkirin.

> Me beriya wê bûyerê wê apartmanê çêkiribû. Her xanîyek ji bo kurekî xwe veqentandibû. Niha jî li vir kesên xerîb dijîn.
>
> Dayika Emîne

Em dikevin malê. Çend deqîqe şûn da zîla derîyî lê dikeve. Keçikeka bi porê reş dikeve hundir. Ew neviya dayîkê ye û navê wê Rojda ye. Rojda 4 salî ye. Dema 4 mehî bûye bavê wê Fadil Şenyaşar ketîye girtîgehê.

Dîya wê Fadîle, wêneyê di telefona xwe de nîşanî min dide.

> Ev wêne yê yekem û tekane ye ku keça min bi bavê xwe re kişandiye.

Wêne li ber dîwarê betonî hatiye kişandin... Rojda wê rojê ji bo serdana bavê xwe çûye girtigehê.

Êvarê dayika Emîne ku edî bibû dapîra Emine, bi nêvîyên xwe re wext derbas dikir.

Ew roj ji bo malabata Şenyaşarê rojeke asayî bû.

Dayîka Emîne dê sibê dîsa biçûya edlîyeyê çawa ku di çar salên dawî de her roj gotiye "Edalet" wê dê disa bigota "Edalet".

Nîşe: Ev nûçe ji alîyê Berîl Caymazê ve ji bo Gazete MLSAyê bi tirkî hatiye amadekirin.

# Bi 5 pirsan li Îranê jehrkirina xwendekarên keç

Gulistan Korban  Adar 09, 2023



**Li Îranê 3 meh in xwendekarên keç li dibistanan tên jehrkirin.**

Bûyer di nava civakê de bû sedema tirs û aloziyê.

Me bi 5 pirsan re tişta ku li wî welatî diqewime berhev kir.

### 1- Çawa dest pê kir û li kîjan bajaran derket?

Yekemîn bûyera jehrkirina xwendekarên keç 30ê Mijdara 2022yan li dibistaneke keçan ya li bajêrê Kumê hatibû dîtin.

Piştre li bajêrên din ên welêt jî derket holê.

Li gelek eyaletan bi hezaran xwendekar bi jehrî ketin.

### 2- Kîjan jehr tên bikaranîn û bandorên wan çi ne?

Gaza jehrî bi bêhna porteqalan an jî tirşiya xerabûyî tê hîskirin.

Xwendekarên jehrî dibin bi giliyên wekî pirsgirêkên bêhn, gêjbûn û westandinê li nexweşxaneyê tên dermankirin.

Xwendekarên ku jehrî ketine paşî diwestin û bêhnteng dibin.

### 3- Li pişt vê bûyerê kî heye ye?

Derbarê kê û kî li pişt jehrêkirina komî heye de agahiyeke zelal heta niha bi dest neketiye.

Malbatên xwendekaran rêveberiya Tehranê sûcdar dikin.

Dijberên rejîmê jî dibêjin ku dewleta Îranê dixwaze tola xwepêşandanên Jina Amînî ya bi pêşengiya jinan pêk hat, hilîne.

### 4- Nêzîkatiya rêveberiya Îranê çawa bû?

Di destpêkê de li hemberî bûyerê tu daxuyanî ji rêveberên Îranê nehatin.

Piştî bilindbûna hejmaran, Serokkomarê Îranê Îbrahîm Reîsî ji bûyerê “dijminên Îranê” sûcdar kir.

### 5- Berteka dê û bavên xwendekaran çi bû?

Hin dê û bavên ku ji rewşa zarokên xwe bi fikar bûn, li ber dibistanê dest bi nobetê kirin.

Hin dê û bavên ku rêveberiya dibistanan û hukûmetê ji bûyerê berpirsyar dibînin jî li gelek bajaran xwepêşanan organîze kirin.

# Wêne-Nûçe: Li Amedê 8ê Adarê...

Beril Caymaz Adar 08, 2023




Bi sedan jin li Amedê bi wesîleya Roja Jinan a Cîhanê ya 8ê Adarê li Parka Daristana Bajêr kom bûn. Jinan di çalakîyê de bi piranî slogana “Jin Jiyan Azadî” gotin.












*Çalakîya jinan di bin dorpêça polîsan de pêk hat.*




*Di çalakîyê de jinên hatine qetilkirin bi mûman hatin bi bîr anîn.*



*Ji bo jinên di erdhejê de mirine jî mûm hatin vêxistin.*



*Hinek jin jî neketin nav dorpêça polîsan û çalakî ji dûr ve temaşe kirin.*

# Li herêma erdhêjê jin: Dema serê xwe dişom cilên xwe yên binî dernaxim

Gulistan Korban  Murat Bayram  Adar 08, 2023




*Kampa Mexdûrên Erdhêjê – Diyarbekir*

Erdhêja 6ê Sibatê bandor li her kesî kir.

Lê wekî her bûyerên bi vî rengî, jin, zarok, extîyar û penaber ji vê felaketê betir para xwe girtin.

Fatma Çadira ku li mala xwe ya Hatayê bi erdhêjê re rû bi rû ma, ji wan jinan tenê yek e.

> Ji wê rojê ve derûniya me xira bûye. Em nekarin ji bandora erdhêjê derbikevin. Dema serê xwe dişom kincên xwe yên binî dernaxim. Dibêjim ger erdhêjek çêbibe ez zûtir bikaribim derbikevim derve. Him xwe bêtir ewle hîs dikim.
>
> *Fatma Çadir*

Ew hemşîre ye û dayika 2 zarokan e.

Bi salan e li navçeya Samandaga ya Hatayê kar dike.

Di erdhêja yekem ya 6ê Sibatê de beyî pêlav û bi tevî kincên xwe yê raketinê ew û zarokên xwe direvin kolanê.

> Em 5 şevan di erebeyê de raketin. Ji bo jinan problema herî mezin tuvalet e. Hê jî ew pirsgirêk berdewam e. Bi rojan ez bi şev neçûm tuvaletê. Ji ber ku diviyabû hevserê min jî bi min re bihata.
>
> Lê ger ew bihata wê demê kes li cem zarokan me nedima. Wekî min bi sedan jin hebûn ku nekaribûn biçûna tuvaletê.
>
> *Fatma Çadir*

Ji bo jinan gihîştina hewcedariyên bingehîn yên wekî ‘ped’ û kincên binî ên paqij pirsgirêkek cidî ye li devera erdhêjê.

Fatma dibêje ku jinên ku regl dibin nekarin pedên xwe û her wiha kincên xwe yên binî bigûherînin. Ji xwe ew ortam jî nîne.

Fona Nûfusê ya Neteweyên Yekgirtî eşkere kir ku li  herêma erdhêjê 15 mîlyon mirov ji erdhêjê bi bandor bûne.

Lê ji wan 4 mîlyon jin in ku hewcedariya wan bi xizmeta tenduristiya dayikan heye.

# Îro 8ê Adarê ye – ‘Gulîstan Doku li kû ye?’

Beril Cayma Adar 08, 2023




Navenda Mefên Jinan a Boraya Amedê bi wesîleya 8ê Adarê, Roja Jinan a Cîhanê li pêş Edlîyeyê daxuyanîyek da.

> Mîxabin em îsal 8ê Adarê Roja Jinan a Cîhanê di nav erdêjê de pêşwazî dikin.
>
> Piştgirîya ku ji erdhêjê vir ve li her derê hatiye nîşandan tekane tişt e ku êşa me hinekî sivik kiriye.
>
> Navenda me ya mefên jinan gelek pirsgirêkên jinên ku di erdhêjê de mexdûr bûne çareser kir. Me di tevahîya pêvajoyê de taybetî ji bo gihandina berhemên paqijîyê piştgirî da.

Piştî daxuyanîya baroyê, gotinên Aygul Dokuyê bal kişand.

Aygul Doku 1160 roj in li xwîşka xwe, Gulîstan Dokuyê digere.

> Jin tên kuştin, jin tên qetilkirin, jin di bin zordestîyê de ne û jin mehkûmî tarîtiyeka mezin de ne.
>
> Ger piştî 3 salan Gulîstan hîn nehatibî dîtin, nasname û nijada we ferq nake sibe wekî Gulîstanê îhtimala windabûna xwîşk û keçên we jî heye.



**Gulîstan Doku li kû ye?**

Xwendekara Zanîngeha Munzurê Gulîstan Doku di 5ê Çileya 2020an de winda bû û ji wê demê ve tu agahî jê nehatiye girtin.

Pirsa ku ‘Gulistan Doku li kû ye?’ îro jî bêbersiv e.

# “Bila heta serê sibehê bêje tune ye, ma tune dibe?”

Beril Caymaz Gülistan Korban  Adar 07, 2023




**Serokê Partiya Tevgera Netewperest (MHP) Devlet Bahçelî got,”Ji bo me cihekî wekî Amedê nîne û dê behsa kulubek bi navê Amedsporê jî neyê kirin”**

Nirxandinên Bahçelî me ji xelkê Amedê pirsî ka li ser gotinên Bahçelî ew çi dibêjin? çi difikirin? https://youtu.be/sQz43dn3NgY



# Fexrîya Adsay: Heta ku em ji çarçoveyeke neteweperwer bêpar bin...

Yonca Sarsılmaz Adar 07, 2023



*Binnivîsa Wêne*

> Keçek ku 125 sal berê di nav malbateke xizan de hatiye dinyê, di nav birek mêr de di guhertina qedera neteweya xwe de bûye xwedî rolek ji ya mêran ne kêmtir, belkî mestir jî. Di temenekî piçûk de bawer kiriye ew jî dikare di nav guhertina qedera neteweya xwe de cî bigre û ev pêk aniye.
>
> *Fexrîya Adsay*

*'Jiyana Min'* a Golda Meir bi wergera Fexrîya Adsayê re ketîbû nav kitebxaneya me Kurdan. Di pirtûka Golde Meîr de em şahidîya kedeke bêhempa dikin. Merîv dikare bêje ku Golda Meir çavên xwe li nav meseleya Sîyonîstan (netewperwerên Cihûyan) û tevgerên sîyasî vedike. Û ev tişt dibe sedemek bingehîn ku tevahîya jiyana xwe bi wan meseleyan re derbas bike. Ji zarokatîya xwe heya heftê salîya xwe, Meir jiyana xwe bi karên damezrandinê dewleta Cihû re derbas kiriye.

Çi bû sedem ku Fexrîya Adsay wê pirtûkê bike kurmancî, dê ew pirtûk çi li me Kurdan kêm an zêde bike, têkilîyeka çawa di navbere Kurd û Cihûyan de heye...

Fexrîya Adsayê ji Botan Timesê re behsa wergerandina pirtûkê, Golda Meîre, Cihû û Kurdan kir:

**Di hemû pêvajoya wergerandinê de herî zêde we çi hîs kir?**

Bêyî ku pêşî temama kitêbê bixwînim, min dest bi wergerê kiribû. Loma her beşek nû ji bo min heyecanek nû bû. Dema beşek diqediya û diviyabû ji ber karên xwe yî din navber bidimê, hişê min li wir dima û min dixwest di demek zûtir de vegerim ser wergerê. Eyn mîna mirov li benda beşa nû ya rêzefîlimekê be. Her beşekê îlhamek nû dida min. Çawa îlham nede?! Keçek ku 125 sal berê di nav malbateke xizan de hatiye dinyê, di nav birek mêr de di guhertina qedera neteweya xwe de bûye xwedî rolek ji ya




mêran ne kêmtir, belkî mestir jî. Di temenekî piçûk de bawer kiriye ew jî dikare di nav guhertina qedera neteweya xwe de cî bigre û ev pêk aniye.

Jiyana Golda Meir dikare wek dîroka damezrandina dewleta Israilê jî bê xwendin. Di her rûpelî de ji vê dîrokê tiştekî nû hîn dibûm û şexsiyetên girîng ên vê dîrokê nas dikirin. Dema navê ciyekî, bûyerekê an kesekî derbas dibû, gotinên Golda têra min nedikirin, ez bi xwe ji google an youtubê li wan digeriyam û bêtir agahî bi dest dixist derbarê wan de, vê jî kêfek mezin dida min. Wê demê kî di ber min re biçûya min dixwest ji wan re qala Golda, sîyonîzm û Israîlê bikim.

Ji aliyekî ve jî, dema min ew û em didan ber hev, xemgîn dibûm; gelek caran hêrs dibûm. Min didît di me de çi kêm be, bi wan re ew heye. Me çi kêm hiştibe, me nikaribe çi pêk bînin, wan ew pêk anîne. Loma her carê difikirîm û heyfa min lê dihat ku zûtir haya min ji vê berhemê çênebûye û wernegerandiye. Û helbet min hêvî dikir ku ji me gelek kes vê kitêbê bixwînin; haya me ji tecrubeya îsrailiyan û tecrubeyên çêbibe, ev bibe sedem ku em li ser xwe bêtir bifikirin.

**Pêwîstîya pirtûka 'Jiyana Min' di Kurdî de çi ye, dê kîjan valahîyan dagire?**

Îro nêrîna piraniya me ya derbarê Îsrailê xwe dispêre meseleya Filistînê. Em, wek gelekî mexdûr û bindest xwe dikin hevalê filistiniyan û tenê bi wan re empatî dikin. Lê em bala xwe nadin gelê cihû ku heta sala 1948an ew bixwe mexdûrtirînên cîhanê bûn, li ber lingên dinyayê dipelçiqîn. 2000 sal berê ji welatê xwe hatibûn qewirandin, li çar aliyê dinyayê belav bûbûn û hema hema li her derê dibûn hedefa nefreta antîsemitîzmê. Li dinyayê belkî ti gel demek ewqas dirêj (2000 sal) bi qasî wan nebûye hedefa nefretek ewqas mezin û nebûye armanca şîdetek ewqas mezin (şîdeta serdema navîn û Holocoust hwd.). Lê îro Israîl di çi halî de ye,

em wê dibînin, lê bala xwe nadinê bê çawa ji wî halî hatine vî halî. Tevî Dewleta Cihûyan a Theodor Herzl û Meseleyek Girîng a derbarê Eliezer Ben-Yehuda de, Jiyana Min behsa vê dike ji me re. Ji bo em Israila îro û meseleya Filistinê jî baştir fam bikin otobiyografiya Golda Meir ji me re gelek tiştan dibêje.

Ya din, wek ku min li jor jî got, jiyana Golda dîroka damezrandina dewletekê û îzehata aqlê siyonîst e jî, lê siyonîstên (em dikarin siyonîzmê wek neteweperweriya cihûyan pênase bikin) çepgir. Ji ber ku Golda ji ciwantiya xwe ve di nav siyonîstên çepgir de cî girtiye. Em, wek neteweyek hê qedera wê di ne destê wê de ye, zanîna tecrubeya damezrandina vê dewletê û serkeftinên wê dibe ku  valahiyekê dagire. Di warê fikra dewlet, dewletbûnê, neteweperwerî, zimanê neteweyî, girîngiya sazîyên neteweyî, aqlê organîk, xwemalîkirina teoriyên mezin de dikare gelek tişt li xwînerên xwe zêde bike.

**Di pirtûke de herî zêde çi bala we kişand?**

Pêşî îdealîzm û xîretkêşiya Golda ku di temenekî pir ciwan de dest pê dike û heta dawiya emrê wê her diçe xurttir dibe, ev têra xwe îlhambexş bû rastî. Ya din, kedkariya wê. Li Filistînê (beriya avabûna Dewletê) di avakirin û geşkirina saziyên civakî de di her astê de wê ked daye. Li kibbutzê (çêwliga kolektîf) ji her cûre karê cotkarî û xwedîkirina mirişkan bigre heta rêvebiriya saziyên cûrbicûr, li Amerîkayê perehevdan, û piştî avabûna Dewletê jî, sefîrî, wezîrî û serokwezîriyê.

Ya herî girîng ku bala min kişand, rêbaza siyonîstên sosyalîst û tetbîqkirina wan a fikra sosyalîzm bû. Wan fikra sosyalîzmê ji xwe re kiribûn rêber lê sosyalîzma reel a ti welatan kopî nekiribûn. Wan sosyalîzm bi temamî li gor şertên Filistînê şîrove kiribûn û saziyên xwe li gor xwe avakiribûn. Fikra sosyalîzmê rê li ber fikra neteweperwerî û dewletbûnê negirtibû, bîlakîs wan fikra sosyalîzmê kiribûn xizmeta fikra neteweperweriyê û dewletbûnê. Aqlê wan, rêbaza fikirîna wan û rêbaza peydakirina çareseriyan pir resen bû, bi temamî aidî wan, axa wan û civaka wan bû. Aqlê wan hew li ser çareseriyan dixebitî, ji çareyan pê ve serê xwe bi tiştekî nediêşandin. Ji bo wan pirsgirêk jî armanc jî rêbaz jî zelal û diyar bû. Pirsgirêk belavelabûna wan bû; armanc li Filistînê geşkirina civaka cihûyan û damezrandina dewleteke cihûyan a wekhevîxwaz, demokrat û modern bû; rêbaza wan sosyalîzm û sekularîzmeke aidî wan bû.

**Di piraniya pirtûkê de Golda Meir her bi kesayeta xwe ya netewperwerîyê derket pêşîya me. Çima kesayeta jinbûnê li paş dimîne?**

Belê, di kitêbê de ew her tim bi kesayeta xwe siyonîst/neteweperwer li pêş me ye. Lê, ji jinbûna wê bêtir em dikarin bibêjin jiyana wê ya şexsî û malbatî li paş maye. Berpirsyariyên wê yên civakî û siyasî pir zêde ne û ev her tim dikevin pêşiya berpirsyariyên wê yên malbatî û şexsî. Salên navbera 1922-1975an pir dijwar in di dîroka Filistîn û Israilê de û Golda bi performanseke mezin her tim çalak bûye di van salan de. Di jiyaneke ewqas çalak û îdealîst de, di nav ewqas kar û xebatên civakî û siyasî de asayî ye ku aliyekî jiyanê li paş bimîne.

**Li gorî we çi ferq di navbera me kurdan û cihûyan de heye?**

Navbera me û cihûyan de bi giştî hin cudatî û manendiyên sereke hene helbet. Yek ji cudatiyan ew e ku cihû li çar aliyên dinyayê belav bûbûn, em her dem li ser axa xwe bûn/ne. Ya duyem, derbarê zimên de ye. Ji bo wan jî ziman hêmanek girîng e ji bo nasnameya wan a neteweyî, ji bo me jî. Lê serencama meseleya zimên û ya me ji hev cuda ye. Di gotûbêja Avestayê ya li ser Herzl û Ben-Yehuda de, ji nav guhdaran hevalekî gotibû, “zimanê wan mirî bû, wan ew vejandin; yê me zimanekî zindî heye, em winda dikin/dimirînin.” Heta radeyekê tesbîtek rast e ev, lê em ji bîr nekin ku ew herî kêm li dor sê hezar salan xwedan kitêb in, kitêba olî. Yanê di jiyana wan de, axaftina bi îbranî nebe jî her dem nivîs û xwendina bi îbranî hebû. Berî her tiştî sê hezar sal e kitêb, xwendin û nivîs bixwe parçeyek ji jiyana wan bû û zimanê vê xwendin û nivîsê îbranî tenê zimanê wan bû, cihûtî jî tenê ol û baweriya wan bû. Vê civata wan a muxayel her tim zindî hiştibû. Dema em li têkiliya

me û xwendin û nivîsê dinêrin ev cudatiyek girîng e. Kitêba wan a pîroz her tim berê wan dida axa wan û nedihişt bê jibîrkirin. Digel ku ne li ser axa xwe bûn jî nasnameya wan wek qedîmtirîn nasnameya neteweyî bi hezaran salan berdewamiya xwe parastiye. Ê me zimanekî me hebû, lê baweriya me ya olî û yên cîranên me yek bû. Zimanê me di axaftinê de her hebû lê di nivîs û xwendinê de bûye pir kêm kesan, û dîroka vê jî zêde ne dûr e.

Lê bawer dikim di vê pirsê de mebesta te bêtir cihûyên siyonîst e. Ji ber ku di Jiyana Min de em cihûyên siyonîst dibînin. Helbet, siyonîzm jî fraksiyonên wê cûrbicûr hebûn. Ji ber ku Golda û rêxistina wê sosyalîst bû, ez ê behsa wan bikim. Li jor jî min gotibû, di vê kitêbê de tişta herî zêde bala min kişand reseniya fehma wan a sosyalîzmê bû. Çawa ola wan û dîroka wan ji ya gelên din cuda be an tenê aidî wan be, fehma wan a sosyalîzmê jî ji ya neteweyên din cuda bûye. Di vir de navbera me (sosyalîstên me) û wan de cudatiyek mezin heye bi ya min.

Cihû hê dawiya sedsala 19mîn de rêxistinên wan ên sosyalîst hebû. Golda jî di destpêka sedsala 20mîn de xwe di nav rêxistinên sosyalîst-siyonîst de dibîne. Yê me 60-65 sal berê fikra sosyalîzmê di ser tirkan re tê nav me (li bakur) û pêşî em di nav rêxistinên wan de cî digrin (mîna TİPa tirkan)... Hê di salên 1970yî rêxistinên me yên sosyalîst çêdibin. Di nav cihûyên sosyalîst de jî yên ku li dijî siyonîzm/neteweperweriyê derketine hebûn, lê mîna Golda û ew qadroya dewleta Israîlê damezrandin, aliyekî xurt ê siyônîst/neteweperwer jî hebû. Dema em li dîroka me ya 60 salên dawî û îroya me dinêrin, fikra sosyalîzm an çepgiriyê bi giştî rê li ber fikra neteweperweriya kurdî girtiye, nehiştiye neteweperwerî geş bibe. Heta neteweperwerî fam jî nekirine, hewl nedane fam bikin ku îro jî ev hê didome. Fraksiyonek jî ranebûye xwedî li fikra neteweperweriyê derneketiye. Rewşenbîrên kurd jî ji ber ku piranî li derdora rêxistinan cî girtine, rewşenbîrek derneketiye fikra neteweperweriyê dernexistiye pêş. Bi qasî dizanim tenê ji Başûr Cemal Nebez wek rewşenbîr li hemberî bayê xurt ê çepgiriyê derneketiye û xwedî li fikra neteweperweriyê derketiye. Ewqas sal e hê lîteraturek me çênebûye li ser neteweperweriyê. Hê jî em bi çavên teorisyenên serdestên xwe li neteweperweriyê dinêrin. Hemû teoriyên hemû cîhanê ji ber dikin lê em bi aqlê xwe, li gor şert û merc û hewcedariyên xwe ji nav xwe teorî dernaxin an rengê xwe nadin wan teoriyan û wan nakin xizmeta xwe; ji jiberkirin û dubarekirina teorî, fikir û gotinên ku ne li gor şert û mercê me ne, wêdetir naçin. Helbet, divê ev neyê famkirin ku em guh û çavên xwe ji dinyayê re bigrin. Mebesta min ne asotengiyek bi vî rengî ye. Ya girîng, em ji van fikir û teoriyên beriya xwe, derveyî xwe çawa îstifa dikin, em wan çiqasî dikin malê xwe an em çi li wan zêde dikin an nakin, mesele ev e. Carna dema li me dinêrim, dibêjim aqlê me hê kamil nebûye, qey loma em ji teqlîdkirinê wêdetir naçin û bi ser de em vê wek marîfetek mezin jî dibînin. Aqlê kamil ji teqlîdê direve, êdî ew bi xwe diafirîne, neafirîne jî tiştekî ji xwe lê zêde dike, rengê xwe dide ya beriya xwe.

Dizanim ku di nav me de jî bi qasî kesên mîna Golda û hevriyên wê îdealîst, xîretkêş û kedkar hebûn û hene, wek hejmar zêdetir in jî. Lê dema em li pey xwe dinêrin, serkeftinên me pir piçûk dimînin li hemberî wê ked û berdêla me daye. Piraniya enerjiya vala çûye. Rast e, serdestên me ne yek e, ne du ye, û pir xedar in hwd. Lê hê jî em nikarin wek neteweperwer pênase bikin, ji xwe re çarçoveyek neteweyî ya demokratîk û modern diyar bikin, xwe û saziyên xwe li gor vê organîze bikin, ji nû ve saz bikin. Çarçoveya siyonistan diyar bû û em îro Golda bi saya vê çarçoveya siyonîst nas dikin, tişta Golda kir Golda ev bû. Li ba me, hema hema eyn kes in yên herî zêde ked dane an rê li ber mezintirîn çalakgeriyê vekirine û yên herî zêde li hemberî fikra neteweperweriyê disekinin. Heta ku em ji çarçoveyeke neteweperwer bêpar bin, ked û enerjiya me wê vala biçe, çepgirên me jî lîberalên me jî îslamiyên me jî wê teqlîd bin; bi hezaran kurdên ku dikarin her yek bibin Goldayek wê di valahiyê de bimînin an enerjiya wan vala biçe.

# “Navên qewî dê li Le Monde diplomatique kurdî bin”

Murat Bayram Adar 07, 2023


Sibat 2022 Aboneti Piştgirî ku | fr | en | Edîsyonên navneteweyî Têkevin

LE MONDE diplomatique KURDÎ

*rojnamegerîya navneteweyî, hizra azad.*

HEJMARA NÛ ARŞÎV NEXŞE LMDK-EKSTRA GALERÎ DI DERBARÊ ME DE

**Talankirina civata nermnivîsên azad**

Laure Muselli, Mathieu O'Neil, Fred Pailler & Stefano Zacchiroli, Sibat 2022

Dema ku utopyaya dîjîtal a xeyalkirî hê berî sî salan bazarek diwelidand ji 1990î û vir ve, komeke serhişk li dijî her projeyeke girêdayî kokên xwe li ber xwe dida: nermalava azad. Hevparkirî, bidestxistî û îxanetlêkirî ji alîyê dêwên pîşesazîyê ve, dawîya dawî ket rewşeke li ber şikestinê. Di salên 1990î de, li kevîya pîşesazîya teknolojîyên nû, cîhaneke din a dîjîtal derdikeve holê. Pêşvebirên dilxwaz ên ji alîyê erdnîgarî ve dûr, kom bi kom xwe bi rêxistin dikin ji bo sazkirina bi awayekî hevpar nermnivîsên pêşbazîyê yên (...) →

**Lîse û dibistanên navîn ên bi forma Pronote*ê**

Lucie Tourette, Sibat 2022

**Hilbijartina peyvan**

Evelyne Pieiller, Sibat 2022

**Dudilîya Celadet Alî Bedirxan**

Sebahattin Şen, Sibat 2022

**Jiholêrabûna xerîb a Partîya Komunîst a îtalyan**

Antoine Schwartz, Sibat 2022

**Çînê dosyeya kurdan vekir!**

Çetin Çeko, Sibat 2022

Herweha mezintirîn projeya Çînê li Herêma Kurdistanê di warê çand û geştîyarîyê de “Bajarê Bextewar” e. Wisa tê hêvîkirin ku di destpêka vê salê de avakirina projeyê bikin. Di sala 2019an de li Zanîngeha Selahedîn a li Hewlêrê beşa perwerdeya bi çînî hat vekirin. Di 24ê çirîya paşîn a 2021ê de dema ku Konseya Ewlekarîyê ya Neteweyên Yekbûyî (KENY) bi rojeva Iraqê civîya, nûnerê daîmî yê Çînê li Neteweyên Yekbûyî Geng Shuang behsa operasyonên artêşa Tirkîyeyê li Herêma Kurdistanê kir. Shuang bal kişand ser nameya ku Iraqê di (...) →

**Mafîa, sedemên kokvedanê**

Giovanni Ierardi, Nîsan 2021

**Berbejnên Pîrikan**

Sebê Cotkar, Îlon 2020

**Murtaza Lakhani yê Pakistanî nefta Kurdistanê**

**Nebûna nûçeyên li qadê û şerên li studyoyan, reçeteyên**

**Na-radîkalîzasyon, sedemên fîyaskoyekê**

Nîsan 2021

**Sendîka, xeta sor**

Hélène Yvonne

**Le Monde diplomatique kurdî dê di meha Adarê de dest bi weşana xwe ya dîjîtal bike û di meha nîsanê de jî dest bi weşana xwe ya çapkirî bike.**

Le Monde diplomatique yek ji rojnameyên Fransayê yên biprestîj e. Le Monde diplomatique kurdî edîsyona wê ya kurdî ye, digel nivîsên werger, naverokên wê yên xweser jî dê hebin.

| | | | |
|---|---|---|---|
| Allemagne | Argentine | *Anglais* | *Arabe* |
| Bolivie | Brésil | Bulgarie | Chili |
| Chypre | Colombie | Corée du Sud | Espagne |
| *Esperanto* | Finlande | Grèce | Honduras |
| Hongrie | Inde | Iran | Italie |
| *Kurde* | Japon | Luxembourg | Macédoine du Nord |
| Norvège | Pologne | Portugal | Russie |
| Serbie | Suisse | Turquie | |

*Di nav edîsyonên rojnameyê de navê edîsyona kurdî jî heye, LMD Fransî*

### Digel rojnameyê du pêvekên wê jî dê kurdî bin

Koordînatorê giştî yê rojnameyê, Bilal Ata Aktaşî ji Botan Timesê re diyar kir ku hejmarên çapkirî yên rojnameyê dê li Almanyayê bêne çapkirin. Vê gavê ji her jimarekê hezar lib dê bêne çapkirin. Xwendevan dê bikarin bibin abone bi rêya posteyê ji welatên dî rojnameyê bistînin. Herweha xwendevan dikarin bibin aboneyên edîsyona dîjîtal jî. Ji bo rojname li Tirkiyeyê jî bê çapkirin hewildanên ekîbê hene.

> Em ê ji bilî rojnameyê. Pêveka wê ya bi navê Manière de Voir jî her şeş mehan carekê biweşînin. Em ê salê carekê jî Atlasê derbêxin. Ew jî kovarek e ku bi xerîteyan behsa bûyerên jeo-polîtîk dike.
>
> Lijneya şêwirmendîyê ya rojnameyê dê ji navên di warê xwe de qewî û pispor pêk bê. Ew jî dê naverokên xweser amade bikin.
>
> *Bilal Ata Aktaş*

Aktaşî di rûpelê Di derbarê me de yê malpera rojnameyê de, rojname bi van gotinan daye nasîn:

> Gava hûn bixwazin bizanin ka li cîhanê çi diqewime, cihê ku hûn berê xwe bidinê Le Monde Diplomatique e. Ev rojnameya serbixwe û navneteweyî bi awayekî cuda li cîhanê dinêre û balê dikişîne li ser mijarên cuda û resen. Bi awayekî zelal li ser meseleyên dinyaya global û modern disekine û wan pêşkêşî we dike.

### Ekîba Le Monde diplomatique kurdî

Le Monde diplomatique kurdî, ji alîyê Rûpel Multimedia GmbH ve tê weşandin û ekîba wê ji van navan pêk tê:

Birêveberê Giştî

- Murat Satik

Koordînatorê Giştî

- Bilal Ata Aktas

Redaksîyon

- Mahmûd Lewendî
- Nedim Baran

Şêwirmendê Wergerê

- Ergîn Opengîn

Koordînatorê Tirkîyê

- Cumhur Olmez

Dîzayner

- Recep Maraşlı,
- Fabio Biasio

Dîzaynera Medyaya Civakî

- Ayse Boga

# Amedspor ê serî li UEFAyê bide

Murat Bayram  Adar 06, 2023



**Piştî ku Amedspor duhî li Bursayê rastî êrîşên nijadperestane hat wê îro daxuyand ku ew ê serî li UEFAyê bide.**






Tîma Amedspora ku li Bursayê rastî erîşan hatibû li Balafirxaneya Dîyarbekîrê ji aliyê girseyeke mezin ya alîgirên Amedsporê hate pêşwazîkirin.





Li ser daxuyaniya komên alîgir bi sedan kes di serê sibehê de berê xwe dan balafirxaneyê. Girseyeke qerebalix ji bo qafîleyê pêşwazî bike rê ya balafirxaneyê girt.





Otobusa tîma Amedsporê û alîgiran berê xwe dan Stadyûma Şexmûs Ozerî ya Amedsporê. Li wir wê bi beşdariya saziyên civaka sivîl civîneke çapemeniyê pêk bê.

Li aliyê din Platforma Parastin û Piştevaniyê ya Bajarê Amedê jî bo pîştevaniya bi Amedsporê re dê li tesîsên Amedsporê daxuyanik bide.

**Çi bûbû?**

Duh li Bûrsayê, di navbera Bûrsaspor û Amedsporê de maçeke futbolê pêk hat.

Beriya wê bi rojekê, alîgirên tîma Bûrsasporê çûbûn ber otela ku futbolîstên Amedsporê lê diman û sloganên nîjadperest berz kiribûn.

Di maça hat lîstinde jî alîgir û rêvebirên tîma Bûrsasporê êrîşî lîstîkvanên Amedsporê kiribûn.

Ji tîma Amedsporê gelek kes birîndar bibûn.

Tişta ku li Amedsporê hat kirin, ji aliyê gelek kesan ve wekî êrîşek nijaperestî hatibû binavkirin.

# Amedspor di rojeva siyasetê de ye, kê çi got?

Gulistan Korban Adar 06, 2023





**Lîstika li Bursayê di ya navbera Bursaspor-Amedsporê de bi bûyerên li sahayê qewimî bû rojev.**

Di maçê de alîgirên Bursasporê posterên “Torosê Spî” û endamê  JÎTEMê Mahmut Yildirimê vekirin.

Lîstîkvanên Amedsporê di lîstikê de rastî êrîşan hatin.

Di rojeva sîyasetê de jî ev mijar derket pêş.

Partiyên muxalefetê yek bi yek peyaman belav kirin.




## Partiya SAADET: Em xemgîn in

Serokê Partiya SAADETê Temel Karamollaoglu dibêje;

> Piştî rihê yekîtiyê ku me hefteya borî li qadên kesk dît, we wêne û bûyerên ku me nedixwest di maça Bursaspor-Amedsporê de bibînin, me gelekî xemgîn kirin.
>
> *Temel Karamollaoglu*

*Temel Karamollaoglu*

*https://twitter.com/T_Karamollaoglu/status/1632346029910552577?s=20*

## Partiya GELECEK: Divê berpirs bên cezakirin

Serokê Partiya Pêşerojê Ahmet Davutoglu jî bûyerên li Bursayê qewimî wekî provakasyon bi nav kir.

> Yên ku îro li Bursayê bi destên xwe yên tarî hewl didin tevlîheviyek derbixîn, yên ku dixwazin birayan bera hev bidin, bila bizanibin ku gelê me tu carî nakeve xefika we.
>
> Berpirsên ku li qadê û li derve tedbîr negirtin û rê li ber provokasyonan bi vî rengî vekirin divê bên cezakirin.
>
> *Ahmet Davutoglu*

*Ahmet Davutoglu*

*https://twitter.com/Ahmet_Davutoglu/status/1632433773068288000?s=20*

## Sezgîn Tanrikulu: Emê nehêlin sîyaseta aştiyane manîpûle bikin

Parlementerê CHP yê Stenbolê Sezgîn Tanrikulu jî dibêje,

> Ew afîşên ku di maçê de hatin vekirin, temsîla “dewleta kûr û nîzama avakirî” ya li standan ne.
>
> Em ê nehêlin ev pêkhateya ku di her bendeke krîtîk a Tirkiyeyê de xwe bi yek rengî nîşan dide, siyaset û aştiya me ya civakî manîpule bike. Em maseya xwe mezin bikin.
>
> Sezgîn Tanrikulu

*Sezgîn Tanrikulu*

*https://twitter.com/MSTanrikulu/status/1632434052018913280?s=20*

## Selehatîn Demîrtaş: Em teslîmî bav û kalên wan nebûn, ma em ê..

Hevserokê berê yê HDPê Selehatîn Demîrtaş jî ji girtîgeha Edîrneyê bo Amedsporê peyamek belav kir û pişgirî da klûbê.

> Hûn wek her car serê xwe bilind bikin
>
> @amedskofficial
>
> û fûtbola xweya ecêb bilîzin.
>
> Berdewamiyên siyasî yên Torosa spî ji me re bihêlin.
>
> Em teslîmî bav û kalên wan nebûn, ma em ê li ber bermayiyên wan serî netewînin!

*Selehatîn Demîrtaş*

*https://twitter.com/hdpdemirtas/status/1632444634143023105?s=20*

## 7 kes hatin binçavkirin

Pîştî êrîş û provakasyonên li dijî tîma Amedsporê Wezîrê navxwe yê Tirkiyeyê Suleyman Soylu ragihandibû ku lekolîn dest pê kiriye.

Walîtiya Bûrsayê jî eşkere kir ku 7 kes hatine binçavkirin. 3 midûrên asayîşa cemaweriyê jî ji kar hatine dûrxistin.